

10'ê Xakelêwê, roja şehîdên Kurdistanê ye. Di wê rojê de Pêşewayê navdar ê Kurd Qazî Mihemed, ji aliyê rejîma Paşatîyê ve hate sêdaredan. Li ser vê bingehê, PDK Îranê bi roja Şehîdan nav kir. Ew roj weke sembola bîranîna şehîdên Kurdistanê tê yadkirin û dujminên gel jî tîn şermezar kirin. Li vê rojê de em jî hezaran silavan bo canê paqij yê şehîdên kurd û Kurdistanê dişînin û dibêjin riya wan pir rêvîng be.

Mistefa Hicrî:

# Zindîmana Gelê Kurd, Destkevta Xwîna Şehîdan E



Roja Sêsemî, 10'ê Xakelêweya 1389'ê Rojî, rê û resma roja Şehîdanên Kurdistanê li binkeya Deftera Siyasî a PDK Îranê, bi beşdariya endamên rêberîya Partiyê, nûnerên Partî û saziyên herçar parçeyên Kurdistanê, mêvan, kadro a pêşmerge û malbatên wan birêve çû.

Rê û resma han ji çendîn beşan pêkhatibû. Çûne ser mezarê şehîdan û danana tacegula rêzdanê li ser mezarê şehîd Selam Ezîzî, ji aliyê Kek Mistefa Hicrî ve pêşangeha wêneyên şehîdan, piştê jî di salona civînên partiyê de merasîmê dirêjî bi karê xwe da ku peyama Deftera Siyasî ji aliyê Rostem Cehangîrî, endamê Deftera Siyasî ve hat pêkêşkirin. Herwiha demjimêr 3'ê piştî nîvro a heman rojê, rêzdar Mistefa Hicrî di civînekê de bi malbatên şehîdan re civiya. Deqa axavtînen sekreterê Giştî û herweha Peyama Deftera Siyasî li Paşkoya taybet bi Agirî de.

**Efûya Navneteweyî:**

**Di Sala 2009'an Di Îranê De  
Her Roj Bi Kêmî Yek Kes  
Hatiye Îdamkirin**

R: 3

**Kurd Yekgirtî  
Diçin  
Parlemana Bexdayê**

R: 2

## Rûpela 2

**Birêveçûna  
rê û resma  
10'ê  
Xakelêwê li  
binkeya ...**



## Rûpela 4

**Soza  
Obama Li  
Nav Toza  
Kablê**



Ebdulla Hicab

## Rûpela 5

**Gêçê Û  
Pîrançoq,  
Qelatan Û  
Çeqel  
Mistefa...**



## Selîm Zencîrî

## Rûpela 8

**Jin Û  
Ragihandin**



## Hemîd Muxtarî

## Rûpela 11

**Sêzdebider  
Û Eşq Û  
Şadî**



Rondik



## Li Binkeya Deftera Siyasî A PDKÎ De Rê û Resma 10'ê Xakelêwe Hat Lidarxistin

**R**oja 30'ê Adara 2010'an, li binkeya polîtîbîroya PDKÎ, rê û resma 10ê Xakelêwe, Roja

Şehîdên Kurdistanê, bi beşdariya endamên rêberiya PDKÎ û nûnerên partî û saziyên her çar parçeyên Kurdistanê û kadro û pêşmerge û malbatên pêşmergeyan hat lidarxistin.

Li gor rapora Nûçegihaniya Kurdistanê, ev rê resme ku li sê beşan pêk hatibû, demjimêr 9'ê sibê bi rêjeya pêşmergeyan û meşa beşdaran ber bi goristana şehîdên Kurdistanê, li fêrgeha Siyasî – Nizamî a PDKÎ dest pêkir. Li ser gora şehîdan sirûdên: "Ey Şehîd" û "Merêjin bom fimêskî xem" hatin pêşkêşkirin. Piştê du helbest li ser gora şehîdan bi navên "Şehîd nemire wek şax" û "Serbazî wun" hatin pêşkêşkirin.

Piştê Sekretêrê Giştî yê PDKÎ Mistefa Hicrî, tevî Şehnaz Ekberî, hevîna şehîd Cemşîd Pîrî, tace gulek li ser gora Şehîd Selam Ezîzî danan.

Beşa duyem a rê û resma Roja şehîdên Kurdistanê, bo pêşangeha wêneyên şehîdan hatibû terxankirin, ev pêşangeha ji aliyê beşa şehîdan a



Komîsyona Civakî ya partiyê ve hatibû amadekirin, bi destê Sekretêrê Giştî yê partiyê tevî Awat Hesenzade, hevîna şehîd Çiya Reûfî hat vekirin.

Beşa sêyemîn a vê rê û resmê li hola civînên PDKÎ de hat lidarxistin.

Ev beşe demjimêr 11'ê sibê bi xwendina sirûda neteweyî ya "Ey Reqîb" û deqîqeyek bêdengî bo rêzgirtin ji canê paqijê şehîdan dest pê kir. Piştê peyama Polîbîroya PDKÎ ji aliyê Rostem Cehangîrî, endamê Deftera Siyasî ya Partiyê ve hat pêşkêşkirin.

Piştê Parêzer Îbrahîm Mistefa, endamê Serokatiya Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (Elpartî) bi hilkevta Roja Şehîdan peyamek pêşkêş kir.

Piştê peyama hevbeş a Yekîtiyên Jinan, Ciwanan û Xwendekarên Demokrat ên kurdistanî Îranê ji aliyê Faxir Mewlûdî ve hat pêşkêşkirin.

Di vê rê û resmê de çend helbest û

pexşan hatin pêşkêşkirin.

Hêjayî gotinê ye, ji aliyê çend malbatên şehîdên gundên Niyer a Tengîsera bajarê Merîwanê û 4 malbatên şehîdên Meznavê a Alana Serdeştê û 15 kes ji ciwanên Şoreşvan ên Jaweroya bajarê Sine ve peyama bo vê rê û resmê hatibûn bi şandin û peyman tevî PDKÎ û rêbaza şehîdan nû kirin. Herwiha çend partî û saziyên Kurdistanî jî bo vê rê resmê peyama şand bûn.



## Kurd Yekgirtî Diçin Bexdayê

Hemû lîsteyên Kurdistanê ku ji bo Parlamentoya Îraqê nûnerê wan hene, di civîneke hevbeş de bi serokatiya birêz Mesûd Barzanî helwestek hevbeş girtin û yekgirtî dicing Bexdayê. Herweha li ser Serokkomariya Talebanî jî li hev kirin.

Mesûd Barzanî, Serokê Herêma Kurdistanê di derbarê civînê de wiha got: "Em li ser pêşniyaza Serokatiya Herêmê, bi lîsteyên Hevpeymaniya Kurdistanê, Goran, Yekgirtiya Îslamî û Komela Îslamî re bi amadebûna Serokatiya Parlamentoyê û Hikûmeta Kurdistanê civiyan ku gelek serketî bû".

Piştê biryarên encamên vê civînê eşkere kirin ku pêkhatîne ji:

- Divê pêwendiya navbera lîsteyan bihe normalkirin û li Kurdistanê cezadayina

lîsteyan bê kêmkirin.

- Bi mercê ku hemû alî, lîsteyên xwe

biparêzên lê li Baxdayê de bibin yek fraksiyon.

- Dê li Baxdayê Komîteyek ava bibe daku bi lîsteyên din re hevdîtinan pêk bîne.

- Namzedê gelê Kurdistanê ji bo Serokkomariya Îraqê, Celal Talibani ye.

Her weha Barzanî daxwaz ji nûner û serketiyên Kîrîstiyani û aliyên din kir ku bîne nav vê komê û di civînên dahatî yê wan de di van mijarên jêr de beşdariyê bikin.

Di pirsên neteweyî de

yekdeng bin

-Li Baxdayê de beşdarkirinek ektîv (Fîlî) Garantiyên ku ji kurdan hatine dayîn, bi wextekî baş bîne lêkolînkirin  
- Baweriya giştî bi makezagûnê



## Baştirîn Padaş Bo Şehîdan, Domandina Rêya Wan E



**Kerîm Perwîzî**

Di çîhana îro de ku ji mirov re naskiriye û heya qasê ku zanistê eşkere kiriye, li ser erdê tenê bûna tiştê bi navê "Jiyan"ê heye. Di heman demê de li

ser erdê jî tiştê bi navê "Mirin" xwe nîşanî me dide. Li gor pêkhata mejiyê mirov û çawaniya hizrîn û nirxandina mirovan di nasîn û pênasekirina tişt û diyardeyan de, mirov herdem tiştê weke dijber li hember wan de didanê heya ku bikaribe wan pênase bike û bi yê din jî bide nasîn. Dema ku bas ji tarîtiyê dike, li hember ronahiyê didanê Reş li hember sipî, sirû seqem li hember germahiyê, xirabî li hember başiyê, bêhêzî li hember hêzdarî, nebûnî li hember bûnê û mirin jî li hember jiyane, pênase dike.

Mirin, di hizra mirovan de, dawiya şewaza berçav a jiyane ye û li gor ezmûnên mirovan, wan qet nekariye xwe ji mirinê rizgar bikin û di dawiyê de tûşî mirinê hatine. Bi watayek din her tişt bi mirinê bi dawî tê û di civaka mirovahiyê de jî, eva mirin e ku çarenivîsa her takekê/î nemaze yê herî baş jî.

Lê her li vir û di vê xalê de ye ku cudahiyeke di navbera mirov û candarên din de derdikeve ku ew jî eva ye: Mirov take candar e ku dizane mirin heye û her eva ye jî ku raman û hizra mirov di jiyana rojane de derbas dibe û ber bi tiştên giştî xwe hildikêşe û dixwaze bi nasîn, peydakirin, perwerdekirin, ciwankarî û destkarî kirina çîhanê û bi huner û afirandinê, bi ser mirinê de ser bikeve.

Di nav mirovan de, bi vê têgihîştinê ku dawiya jiyane mirin e, mirov li hember mirinê de bo ser çend deste û taqîman dabeş dike. Yek ji wan eve ku mirin ber bi aliyê wan tê, bi helatina berdewam xwe gél kirin ji mirinê dixwazin mirinê jî bîr bikin. Desteyek din ji mirovan jî hene ku dixwazin bi kiryarên mirovî û afirandin û hunerê, mirinê biçok de binin û di vê navberê de girûpek ji mirovan jî hene ku bi hişyarî û zaniyarî ve ber bi mirinê diçin heya ku mirinê li hembêz bigrin. Pêşwazîkirina wan kesan ji mirinê ne nîşaneyê hezkirina wan ji mirinê ye, belkî ew ji wan kesan in ku bi sedema mirina xwe agah in û dizanin ku çima mirinê hildibijêrin û di pêxem hizrek bilind û bextewerî û rehetiya mirovên din de rêyekê hildibijêrin ku dizanin mirin dê berbi rûyê wan bibe û li benda wan sekiniye. Lê ew dizanin ku bona bexteweriya mirovên derbara xwe divê xwe gorî bikin gorî û bi pêşkêşkirina canê xwe, di bîr û hizra mirovên din de zindî dimînin û bo nîfşên piştî xwe dibin bi ustûre û bi vî awayî jî hermanê dikin bi nasname û Şehîd jî dibe bi nav û dengê wan.

Ew di nava dilê netewa xwe de her dem zindî dimînin û sîng bi sîng û nîfş bi nîfş navê wan dibe bi navê xwestiviyan û dergoşên malbatan, rêbaza wan berdewam dibe û li ser vê bîngeha hizrî ku şehîd namire û di hizra civakê de cih digire, dibine şonas û nasnameya netewayekê.

Li hember şehîd de, bîrû hizrînê cuda cuda di navbera mirovan de hene û rêbaz û mektebên curbicir hene ku helwesta wan li hemberî şehîdan de cuda ye. Di vê navberê de hizr û bîrkirinek wisa heye ku şehîd û şehîdbûn bal wan, bi jiyana naskirî û rûyekî amirov de dawî nebe û bawerin ku kesên şehîd, bi terzek din û di jiyaneke din de ne û

dê encam û berhema kar û xebatên xwe bistînin.

Bîrkirinek din jî heye ku dawiya her tiştî di mirinê de dibîne, lewra kesên han şehîdan weke wan kesan pênase dikin ku canê xwe ji bo bexteweriya civakê gorî kirine û li rastî de bi qedirgirtin ji wî karî, dibêjin ku ew kesên jêhatî û hêja ne ku tiştê pêşkêşkirin û çûn.

Di vê navberê de Dr. Qasimloyê Şehîd, rêberê navdar ê gelê Kurd, bi pênasekirinek cuda ji şehîdan, rêbaz û bîrkirinek nû aniye nav netewa Kurd de. Dr. Qasimlo dibêje: "Baştirîn padaş û xelat ji bo şehîdan, domandina rêya wan e. "Ew di wê gotina xwe de ji aliyê we bas ji vê yekê dike ku karên girîng û beşxende yî a wan, anku şehîd li hemberî gorîkirina canê xwe ku, karekî pirr binirx e, hewce hî bi dana padaşê dike, nek tolhildanê.

Hin mirov hene ku li hember şehîdan de tenê hest û soza kesî a xwe eyan dikin û bîr ji tolhildanê dikin ku eva ji buha û nirxa karê şehîdan kêmtir dike. Lê Dr. Qasimloyê rêber û zana, îşare bi peyva **Padaş** dike, heya ku li cihê bîrkirin ji tolhildan û eyankirina kerb û kîn û bêzariyê, xwîn û tekoşîna şehîdan bibe bi hêvîyê berdewamiya xebat û jiyana şorşevanî.

Ger şehîd bi terzek hişyarane, mirinê biçok tîne û di dilê xelkê de dimîne, domandina rê û rêbaza wan bi terzek berdewam, remza sereke a man û nemirina şehîdan e. Lewra Dr. Qasimloyê şehîd dibêje: "Ew di roja şehîdbûna şehîdên xwe de û di bîreweriyên şehîdan de, li mêjî deme ku me biryar daye negrîn, li mêjî dem e ku me biryar daye take karek ku em dikarin bikin û li berçav û bîranîna şehîdên xwe de şermizar nebin, eva ye ku rêya wan bernedîn û bidomînin.

### Efûya Navneteweyî:

## Di Sala 2009'an Li Îranê De Her Roj Bi kêmî Yek Kes Hatiye Îdam Kirin

Rêxistina Efûya Navneteweyî di rapora salane a xwe de ragihand, di sala 2009'an de 388 kes li Îranê hatine darvekirin . Li gor vê raporê her roj bi awayekî nêwincî zêde ji yek kes li Îranê di sala 2009'an de hatiye îdamkirin û Komara Îslamî rekora rêxistina biryara îdamê li seranserê çîhanê şikandiye.

Di vê rapora de hatiye: Di sala 2009'an de bi kêmî 714 kes li 18 welatên çîhanê hatine îdamkirin û bêtirî duhezâr kesan di 59 welatên çîhanê de biryara îdamê bi ser wan hatiye sepandin.

Ev rapora nîşan dide ku xincî welatê Çînê bêtirî 54 li sedî hukmên îdamên çîhanê li komara Îslamî de rêve çûye.

Rêxistina Efûya Navneteweyî bo yekem car bo nîşandana nerazîbûnê li hember siyasetên ewlekarî yê hikûmeta Çînê derbarê weşandina derkirin û rêvebiriba biryara îdamê li belavkirina serhejmariya

îdamkiriyên wî welatî, xwe parast. Li gor vê yekê di lîsta sala 2009'an a Rêxistina navhatî de: Îran bi 388 nimûne yê îdamê, Îraq bi 120 nimûneyan, Erebiyana Seûdî bi 69 nimûne û Amerîka bi 52 nimûne yê îdamê di pileya yekem hate nîşandan.

Rêxistina Efûya Navneteweyî herwiha di rapora xwe de Îran û Erebiyana wek welatek nav bir ku kesên zarok û nûciwan jî îdam dikin. Di Îran û Sûdanê de cezayê darvekirinê zêde ji hemû welatên çîhanê li ser tometbarên siyasî tê lidarxistin.

Efûya Navneteweyî di rapora xwe de li kiryarên dewletên Çîn, Îran, Bîlârûs, Mexûlistan, Kuriya Bakûr û Vîtnamê li hember weşartina darvekirin û yan rêvebirina îdamê rexne kir.

Bi hevcehbûna hejmarekî din ji welatên wek Bîrondî û Togo di Afrîqayê de bizava hiloşîna cezayê îdamê hejmara wan welatên ku darvekirin û rêvebirina biryara



darvekirinê ragirtine, gihîştê 139 welatan.

Li navbera welatên Afrîqaya reş de, tenê du welatên Bûtswana û Sûdanê cezayê îdamê di yasaya xwe de parastine. Di Qareya Amerîkayê de xincî Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê, biryara îdamê li tu welatekî din di sala borî de rêve neçûye. Di Qareya Asiyayê de Efxanstan, Endonizî, Mexûlistan û Pakistan tu salek bê cezayê îdamê derbaz nekirine. Hêjayî gotinê ye ew serhejmariyên ku hatine belavkirin, ji aliyê Dewletan, Rêxistinên Navneteweyî, Parêzerên Mafên Mirovan û ragihandinên giştî hatine belavkirin û serhejmariya rasteqîne zêdetir e.



## RONÎ

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

Ebdulla Hicab



## Soza Obama Li Nav Toza Kabulê

**S**erlêdana Serokê DYA, Barack Obama ji bo Kabul, paytextê Efxanistanê ji nişkêve bû, lê gerr

bi xwe ji mêjve hatibû pilankirin û amanca gerê jî xuya bû. Ji sala 2001ê ve ku leşkerê Amerîka berda tevgera Taliban û hevpeymanên wê tevgerê û ew ji deselate dût xistin, piraniya serêşiya hemû Serokkomar û karbidestên pile bilind yen Amerîka di siyaseta derve de, mijara şerê li hember terorê û rewşa Efxanistanê bûye. Serlêdana Obama jî bi wê mijarê ve girêdaye. Çunko ji Amerîka û bi taybet birêveberiya Obama re, pêşketin an ewraz û nişivên di şerê li hember tevgera Taliban li Efxanistanê hem di siyaseta derve de û hem ji bo stratêjiya neteweyî DYA giring e. Di wan heyvên dawî de birêveberiya Waşington hinekê ji Hamid Karzay û şeweya wî ji bo birêvebirina welat jî gazinde hebûn. Serdana wê dawiyê hinekî bi wê mijarê ve jî girêdaye. Karzay dema di sala 2002 de ji aliyê birêveberiya Bûş ve weke Serokê deselata nû ya Efxanistanê hate destnîşan kirin, bi biryar bû ku di demek diyarî kirî de hem şerê li hember terorê, bi qazanca hêzên hevpeyman bi dawî bîne û hem jî sistema nû ya siyasiye Efxanistanê bi şewazek modern û demokratîk damezirîne. Lê di wan 8 salên deselatdariyê de Karzay û hevalbendên wî nekarîn tu yek ji wan sozan bi cî binin. Ji wê jî bi der, di wê demê de tu yek ji 34 parêzgehên welat bi tewanî û bi bê arêşe neketin jêr kontrola hêzên hevpeyman an dewleta Karzay de. Ew yek birêveberiya Waşingtonê aciz dike.

Pirsgirêkên serekeyên Efxanistanê ku bi awayekraste rast karîgeriyê li ser têkiliyên welat bi Amerîka re û bi wê re jî girêdayî bi hêzên hevpeyman re datîne, xên cî kêmasiya deselata Karzay bi xwe, bi kêmî 3 warên din jî digre. Yek ji wan mijara şerê li hember terorê û rewşa ewlekariya welat e, mijarek din gendeliya siyasî û abûrî ye u xala sêyemîn kêşeya madeyên hişber an narkotîkê ye ku nav û dengê Efxanistanê weke çavkaniya sereke ya toz û narkotîkê derxistiyê çîhanê.

Li ware şerê bi terorê re, deselata Karzay heya niha ne tenê tu serketinek ji xwe re tomar nekiriye, belkî di hin waran de, ji bo veşartina kêmasiyên xwe, bêtir an heza hêzên Amerîka, deriyê dialogê bi neyaran re vekiriye. Ew, ji aliyê Amerîka ve weke zêdegaviyekê tê hesab kirin. Lê mijara ku hê ji wê jî pitir Amerîka aciz dike, ew e ku

beşek ji sistema Karzay, bi taybet hêzên ji qewmiyeta wî ya Peştûn, pir êşkere bi hêzên Taliban re hevkarîyê dikin.

Ev hevkarî eger, ne bi dilê Karzay û deselata wî bi xwe be jî, lê di piratîkê de pêk tê û weke astengiyek sereke di pêwendiyên navbera hêzên hevpeyman û birêveberiya nû ya Efxanistanê de tê temaşê kirin. Gelek caran jî ew yek bêbaweriyek wisan di navbera aliyan de tine pêş ku tê meraq kirin gelo hevkarîya navbera wan wê heta ku şansê meşyanê hebe.

Hevdem di gel kêmasiyên di eniya şer li hember terorê de, mijara gendeliya siyasî û abûrî di sistema nû ya Efxanistanê de jî ji bo Waşingtonê pirsgirêkek mezin e. Karbidestên nû yên Kabulê hê nekarîne sistemek siyasî, darayî û heta leşkerî ya bi kêr damezirînin ku bikare weke sazîyên dewletê kar bike. Li ser sifreya ne zêde zengîne dewletê jî, her yek ji bo xwe radikêşe. Encama wê rakêş - rakêşê ew e ku di welat de îstiqrar çê nabe û sistem nikare bersiva daxwaziyên hevvelatîyan bide. Di rewşek weha de asayî ye ku hêzên girêdayî tevgera Taliban hem serdest bin u hem xwedî bandor.

Bi awayekê ku ev yek jî li bera xwe ve karîgeriya hê neqenc li ser bê istiqrariya Efxanistanê û berbelawîya gendeliyê datîne.

Lê pirsgirêkên Efxanistanê li vir bi dawî nabin.

Mijara madeyên hişber bela herî mezine serê Efxanistanê û hevpeyman û alîkarên wê ye. Eger hemû jî nebe, pitir ji 95% ji madeyên hişber ku li bazarên Asya û Ewropa tê kirîn u firotin, ji Efxanistanê tê. Li gor raporek ji nuçegihanên BBC ji eyaleta Nengerhar li ser sinûrê Pakistanê, tenê li bazarê Şaddil ya wê herêmê, her rojê bi hezaran kîlo toza Tiryak û Heroinê tê firotin.

Werzagarên ji wê eyaletê û eyaleta Hilmend ku çavkaniyên narkotîka Efxanistanê ne, ji ber nebûna ewlekariya jiyân û derfetên cotkariya asayî, hemû zewiyên xwe kirine kêlgehên Xaşxaşkê. Bêkarî, nebûna stratêjiya neteweyî ji bo parastin û piştigiriya cotkaran, belengazî, hebûna bazar û kiryanan û diravek zêde, bazara narkotîkê zêde geş dike. Li gor çavkaniyên agadar, buhayê ku bi riyê dikeve bazara kirîn û firotina Efxanistanê pitir ji 3 Milyard Dollar e ku dibe 1/3 Berhema Neteweyî ya Xalis BNX ya welat. Li gor gotina William B. Wood, balyozê DYA li Efxanistanê, stratêjiya hêzên hevpeyman

û dewleta Efxanistanê li dijî bazirganiya madeyên hişber li Efxanistanê bi ser neketiye û gera li pey rêbazên nû yên têkoşîna li hember narkotîkê pêwîst e. Beşek zêde ji diravê ku bi riyê wê bazirganiyê ve te bidest xistin, yekser diçe berîka Taliban û tevgerên bi wê ve girêdayî. Beşek ji wî pereyî jî dikeve bazara reşe Efxanistanê û digehe destê karbidestên nû yên welat.

Di rewşek weha de ev karbidest xwe neçar nabînin ku serê xwe bi avakirina sistema nû re bêşînin. Ew mijar pirsgirêkeke ku heta neyê çareser kirin, rê nade Amerîka di stratêjiya xwe ya Efxanistanê de, u bi hindê re jî girêdayî di şerê li hember terorê de bi ser bikeve.

Lê ji bo Serokkomar Obama, morala leşkerê Amerîkayê li Efxanistanê ji mijarên ku hatin bas kirin, eger giringtir nebe, kêmtir jî nine. Leşkerê Amerîka û hevpeymanan, di gel ku îmkânên herî nû yen serbazî bikar tînin, lê hê nekarîne bi ser şerkerên Taliban de bi ser bikevin. Berevajî, Taliban niha ketiye pozîsyonek wisan ku hin caran mercên xwe bi ser aliyê deselatdar de ferz dike û hêdî hêdî aliyê din neçar dike ku pêre bikeve dialogê. Di rewşek weha de, leşkerê Amerîka pêwîstî bi piştigiriya Serokê xwe hene heya xatircem bin ku xebata ew li derveyî axa Amerîka dimeşînin, li ber çavên rêveberên wan winda nabe.

Di heman demê de ku Obama xwe neçar dibîne ku zêde dîna xwe bide rewş û morala serbazên xwe, neçar e berawirda paşekîşiyê jî bike û ji riyên derbasbûn li qeyrana Efxanistanê jî bigere. Ji ber ku wî bi soza "guherîne" pêşbirkêya Serokkomariya qazanc kir û beşek ji wê soza guherîne bi guherîna siyaseta navneteweyî re girêdayî ye. Lewma guherîna hem di warê navxwe û hem di siyaseta derve de ji bo pêşeroja siyasiye Obama û ji bo navbanga wî ya dîrokî pir giringe. Mijara serketin bi ser terroîzmê de bi qasî siyaseta xwemalî karîgerî li ser siyaseta Amerîka heye. Lewma Obama hewl dide demekê ji ya din zûtir soza hîlbijartinê di derbarê şerê li dijî terroîzmê de bi cîh bîne.

Bi kurtî; ewlekariya Efxanistanê, bi dawî anîna şer bi awayek serbilindane û di dawiyê de jî amade kirina zemîneya paşekîşiya leşker, mijarên giringiyên sefera Obama bûn. Lê gelo Kabula tije toz û pir ji aloziyên siyasî, gendeliya îdarî û bê ser û beriya malî wê çiqas ji biçînanîna soza Serokkomarê bilez re alîkar be!

Gêçê, Pîrancoq, Qelatan û Çeqel Mistefa

## Kuştar û Cinayetên Ku Nahên Jibîr Kirin



**Selîm Zencîrî**

Gelê Kurd wek yek ji gelên herî kevnar û resen yê Îranê ji bo rizgarbûnê ji zîncîra zulm û stema rejîma dîktatorî a Paşatîyê, milbîmilê gelên din yê Îranê

xebat kir heya ku gihandin encamê. Lê piştî şoreşa gelên Îranê li sala 1979'ê Zayînî de ku derfet û fersenda dadperweriya civakî û mafên wekhev ji bo gelên Îranê hatibû rexsandin, ne tenê derfet hat beravêtin, belkî ew piroje û armancên ku hikûmeta Şa li serkut û tepeserkirina azadîxwazan û netewên bindest de têde serketî nebibû, bi awayek sîstematîk ji aliyê komek melayên tarîperest ve hat domandin û destkevtên şoreşê jî talan kirin. Me dît ku tenê mehek piştî xistinexwara peykerên Şayê dîktator, neteweya kurd tûşî malwêranî, komkujî, derbiderî, êş û azar hat kirin û tama serketina şoreşa 1357'ê jê tehl kirin.

Li vê derheqê de rejîma taze bidesthilat gihîştî her li destpêkê de naveroka dijî gelî û dijî buhayên mirovî a xwe eşkere kir û ji tu pîlan û cinayetê dijî xelkê Kurdistanê xwe neparast. Herweha berevajî hewl û xebatên wê demê yê rêberên hêzên Siyasî û yek ji wan jî nemir Dr. Qasimlo, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê ji bo diyalog û çareseriyê siyasî û aştiyane a pîrsan, rejîmê piropagende û siyasetek xurt û berfireh a şer teyîsandinê li dijî kurdan meşand û xwastên rewşa û berheq yê kurdan ku mafên siyasî, çandî, civakî û aborî yê wekhev û yeksan û herweha jinavbirina her terze cudahîdanek regezî, mesebî û netewî li çarçoveya Îranê de bû, bi xwasta cudabûnê "Tecziye telebî", pîlanên biyaniyan û dujminên Îslamê dihesiband, tenê bona wê ku hêcetek bona serkut û mîlîtarîzekirina Kurdistanê ji wan re dest bikeve.

Eve bû me dît ku Xumênî û rejîma wî li cihê mifahstandinê ji desthilat û pêgeha



menewî û civakî a xwe li pêxem cihgîr kirina azadî, edalet, wekhevî, dermankirina birîn û qerebû kirina azardîtiyên ji zulma Şayê dîktator, lê wan jî riya zext û givaş, şer û cinayet xolqandinan girtine pêşberî xwe ku heya niha jî ew şer dirêjî heye.

Lewma ji Sine, Pawe, Meriwan û Seqizê re pêre hat heya gihîşte Mehabad, Şino, Nexede, Urmiye û Selmas û Makûye û dest avête kuştin û îdam kirina xelkê bê tawan, çandina tovê dijberî û dubendiyê li navbera her du gelên Kurd û Azerî ( ku bi salan bû weke du birayan dijiyan) de, sepandina şerek nerewa û bêberamber û bi giştî desthilata hov û dîktatorî a xwe bi ser xelkê Kurdistanê de sepand. Li vê navberê de gelek bûyer û qewmînên xembar û dilêş bi destê hêz û celladên binav û deng yê xwe wekî Çemran, Xelxalî, Mela Hesenî û...HTD li karnameya reş a xwe û li deftera bîranînên kurdan de tomar kirin ku kê mînak in û bi wan cinayetên jî rûyê cellad û xwînmijên din sipî kirin.

Cinayetên ku bi awayek rêxistinî li Kurdistanê de bo bédengkirin û temirandina hawara azadîxwazî û mafxwaziya xelkê Kurdistanê û asimîlekirina vî gelî birêve çûn û nemaze ger bi rûyekî jî be, ne tenê ew tawan û cinayet mehkûm, û lêpîrsîn jî li gel encamderên wan bûyeran de nekirin, belkî biker û bikuj teşwîq û xelat dikirin. Herweha daxwaza pere û qerebûya gulleyan ji malbatên goriyan dikirin. Lewre her rojek ku tê û em rûpelên rojîmêra dîrokê hildidin, yad û bîranîna bûyer û cinayetê jî me re zindî dibe ku hiş û heybet û wijdana mirov dihejîne û kerb û kîn û bêzariya mirov ji vê sîstem û desthilata hov zêdetir, îman û îrade û agirê xebata dijî wê jî gurrtir, çepera berxwedanê jî qahîmtir, hêviyên bi nemana rejîmê û pêşerojê jî zindîtir û geştir dibe.

Ev hejmara Agirî hevdem e li gel

salvegera komkujiyê gundê Qelatan a Nexedê li 6'ê Xakelêweya 1358'ê Rojî de ku 13 hevvelatîyên bêtawan têde hatin şehîd kirin.

Herweha kuştara xelkê gundên Gêçê, ser bi devera Somaya Selmasê li 3'ê Xakelêweya 1362'a Rojî de, ku 13 kes şehîd, çendîn kes birîndar û hejmerek jî hatin girtin.

Herweha kuştara xelkê gundê Çeqel Mistefa a Nexedê li 4 û 5'ê Xakelêweya 1362'ê de ku 21 kes hatine şehîd kirin.

Herweha kuştara xelkê gundê Pîrancoxê li devera Soma ya Selmasê li 7'ê Xakelêweya 1362'ê Rojî de ku têde 17 kes hatin şehîd kirin. Hêjayî gotinê ye ku di her yek ji wan bûyer û cinayetên de, xêncî wan kesên ku şehîd û birîndar dibûn, mal û halê xelkê jî di hate talankirin û hejmerek zaf ji xelkê gund jî di hatin destbiser kirin ku paşan bi tawana hevkarî û endametî li Partiyên Siyasî û bi taybet Partiya Demokrat de bi bê dadgehî, di hatin îdam û tîrbaran kirin. Pêvajoyek ku niha jî berdewame û dîrokek 31 salî a reş û teji tawan û cinayet bo rejîmê û hêzên gumnam yê îmam tomar kirine ku li hovêtî, durûyî û cinayetên de rûyê hemû cinayetkaran sipî kirine.

Lewre bi cî ye ku em li salvegera komkujî û bûyerên dilêş yê gundên Gêçê û Heleqoşk, Qelatan û Çeqel Mistefayê de silavan bişînin bo canê pak yê wan şehîdên bê tawan û bi jibîr nekirina wan tawan, rê nedin ku bikuj û celladên wê demê bihên ji bîr kirin.





## 1388, Sala Jinên Xebatkar Di Îranê De



Sala derbasbûyî, sala xebat û fidakariya jinan, bi taybetî piştî hilibjartina Serokkomariyê di Îranê de bû. Di wê salê de, aliyê kêm 11 jinan canê xwe gorî mafên sîvîl û rewşa ên xwe û hemû helkê Îranê kirin.

Di wê salê de bi dehan jin, pêkhatî ji çalakên siyasî, rojnamevan, çalakên mafê mirov û mafê jinan û zarokan rapêçî girtîgeh û jorên takekesî hatin kirin û bi berxwedaniya xwe li hember dozger, lêpirsîn û îşkencê de, rûpelek nû ji xebata sîvîl vedan ku di nav wan de du jinên kurd ên bi îdamê mehkûmbûyî bi navên, Zeyneb Celalîyan û Şîrîn Elemhojî hene û herwisa di bin metirsiya hukmê îdamê de ne.

Li gor texmîna nûçegihan û çalakên mafê mirovan, hejmara girtiyan di sala 1388 a Rojê de digihîje 10 hezar kesan. Li gor heman çavkaniyê, aliyê kêm 92 kes ji çalakên warê jinan hatine destbiserkirin. Herwiha hatiye zanîn ku aliyê kêm 147 rojnamevan û wêblagnivîs, 565 xwendekar, 46 çalakên Turk, 87 çalakên sîvîl ên Kurd û 126 kes bi hêceta bawerên mesebî hatine destbiserkirin.

## Cangîr Axayê Dirî Çû Ser Dilovaniya Xwe

Roja 29'ê Adara 2010'an, kesatiyê naskirî yê bajarê Urmiyê bi navê Cehangîr axayê Dirî, xelkê bajarokê Sêro li devera Biradost, di temenê 94 saliyê de çû ser dilovaniya xwe.

Nûçegihaniya Kurdistanê di vê derbarê de



da zanîn, Cangîr Axayê Dirî, Serokê hoza Dirî bû. Navhatî her li despêka hatina ser kar a rejîma Komara Îslamî Îranê û êrîşa wê rejîmê bo ser kurdistanê zor bi mêrane û egldane kete çeperê bo parastina xelkê Kurdistanê û bi hemû awayekê tevî siyasatên wê rejîmê şer dikir.

Lewma kete ber êrîşa rejîmê û di encamê de birayê wî bi navê Ismet bi destê hêzên rejîmê hat kuştin. Cangîr heta dawîya jiyana xwe li bajarokê Gewer a Kurdistana Turkiyê akincî bû.

PDKî behî û serxweşiyê li malbat û kes û karên Cehangîr dike û xwe di xem û kovana wan de hevşîrkê dizane.

Rojev

## Kê Dê Şerê Bi Îranê Destpê Bike?

W: Arîn

**D**anîla Pilitka, yek ji vekolerên Enistîtota Amerîkan Întir pirayz, di gotarekê de li rojnameya Wall Street Journal de balê dikîşîne ser

kirîza Navikî ya Îranê û lome û rexneyan ji dewleta Obama digre ku çima hewl û xebat û kiryarên micid ji bo tehrîm û gûşegîr kirina Îranê encam nade. Ew dibêje ku soza Hîlarî Klîntonê, "ji bo sepandina dorpêçên seqetker" û herwiha sozên Obama ji bo "cezayên giran û dijwar" li dijî Îranê, tev de dirûşmên vala û bênavber bûn. Dewleta Amerîka tu yek ji pilanên girêdayî bi daxistina hesabên bankî yên Îranê û tehrîm û li perawêz xistina sîstemên esmanî û deryayî yên Îranê birêve nebirine.

Lewma li gor rewşa mewûcd, çend pirsiyar derdikevin holê ku gelo tehrîman dê tesîr û bandor hebin? Erê gelo Amerîka dê bikare bi Îranek xwediyê hêza navikî re tev bigere û li hev bê? Gelo kiryar û êrîşa leşkirî dê bihê bikaranîn yan na?

Nivîskar paşan diçe ser siyasatên Obama û dibêje, wî bi dirûşma reform û got û bêj bi Îranê re Serokkomariya xwe destpê kir û wisa dixuye ku gellek pêre girêdayî ye û amade nine ku bêencamiya wê bipejirîne. Bi watayek din ew siyasat êdî tûşî şikestê hatiye, lê hêj Obama hêvîdar e. Çunku balnedan û guhnedan Obama bi xwenîşandanên xelkê dijî rejîmê li Îranê de û xemsarî û bê helwestiya wî li hember binpêkirina eşkere ya mafê mirov û herweha guhnedana Îranê bi demên diyarî kirî ji aliyê Obama ve, nîşan didin ku Obama gelek dilê xwe bi siyaseta got û bêj bi Îranê re xweş kiriye.

Derheq tehrîman jî wisan tê xuyakirin ku serbarê got û bêjan, lê Çîn jî weke Rûsiyayê bi tehrîmên berfireh û giran li dijî Îranê, nerazî ye. Heta endamên demkî yên Şêvra Ewlekar ya NY jî weke Turkiye, Bîrîzîl û Japon jî heya niha bi daxwaza Amerîka ji bo sepandina dorpêçên giran dijberî kirine li vê navberê de jî hikûmeta Îranê bi domandin û xurtkirina bernameya navikî xwe demê ji dest nade û Ajansa Vejena Navikî, jî hişdarên xwe li dor vê bernamê zêdetir kiriye û niha jî neçar maye ku belgeyên pêwendidar bi çêkirina du nawendên nû li Îranê de binirxîne. Lewma tê çavnihêrî kirin ku pilana tehrîmên çend alî û giran, carê ji aliyê Amerîka û hevalbendên Ewropayî ve bihê dîrxistin. Serbarê wê ku çend Kompanî û şirketên mezîn û navnetewî, çalakîyên di seneta neftê û hevkarîyên bi Îranê re rawestandine, lê hêj hejmarekî zaf ji Kompaniya dirêjî bi pêwendiyên bazirganî yên xwe bi Îranê didin.

Herweha di çend hefteyên derbasbûyî de



çendîna rêketin û girêbend bi Îranê re hatine wajo kirin. Bo mînak Sermiyandanîna 5.5 Mîlyard Dolarî a Turkiyê di seneta Gaza Îranê û lihevkirina Pakistan û Îranê ji bo çêkirina hêla boriya gazê ji bo şandinê û wajo kirina girêbendek din a şirket nift a Çînê bi Îranê ji bo deranîna niftê li xelîcfarsê de.

Danîla Pilitka di gotara xwe de digîje vê encamê ku sepandina tehrîman, hêdî hêdî tûşî şikestê dibin, lewre niha Amerîka bi du xal û bijaran re berbirû bûye. Yan Îran dê çeka Navikî bi dest bixe û Amerîka jî dê şiyana wê hebe ku xeterî û metirsiyên wê kontîrol û mehar bike. Yan jî, kesek bo ji navbibina vê xetera navikî ya Îranê dê hewl û gavan hilbigre (êrîşa leşkirî). Eva jî li halekê de ye ku welatên deverê, nîgeranê bernameya Navikî ya Îranê ne û tim vê gefê dixin berçav. Welatên erebî bi taybet yên qirax xelîcfarsê, ji tirs û xofa hêza etomî ya Îranê, bi xwe jî ketine pey sîlahên hesteyî. Çunku niha bas ji Erebiistan seûdfî tê kirin ku berevaniyê li hizra kirîna wan sîlahan ji Pakistanê ye.

Ji aliyê dinê jî, kirîza mewcûd li tîkiliyên Amerîka û Îsrailê de bûne cihê nîgeraniya welatên erebî. Ew difikirin madam ku Amerîka berevanî û piştewani ya hevalbendê kevnar yê xwe (Îsrailê) neke, çî garantiyek heye ku ji dostên xwe li deverê de bike.

Nivîskar balê dikîşîne ser bijardeya duyemîn, anku êrîşa leşkirî û dibêje: Rêberên Îsrailê bi tundî ji siyaseta Obama li hember Îranê nerazî ne. Lewma Ger Îsrail bi tenê û yekalî êrîşê bike ser Îranê, bê şik encamên wê, dê berjewendiyên Amerîkayê li deverê de bi nîşange bigre. Lewma Obama rene neçar be dest bi kiriyarekê bide, ku dûr e ji çavnihêriyan. Bi taybet Îran ku carê vê yekê bawer nake.

Danîla Pilitka encamê ji gotara xwe digre ku şikesta siyaseta Obama li hember Îranê, xincî Obama ji hemûyan re eşkere bûye. Lewma tê çavnihêrî kirin ku rewş ber bi şer ve diçe. Lê pirsiyar ev e ku çî kesek dê şer dest pê bike?

## Jin Û Ragihandin



**Hemîd Muxtarî**

Îro rojê medya û ragihandin, bihêztirîn emraz in bona derxistin û xortkirina hizr û ramanan. Herwiha bibandortirîn alav in bona nifûzkirina çand û

hizr û ramanên cuda cuda bo nav dilên civakan de. Lewma basên ragihandinê bûne mijara hejmarek zaf ji basên civakî û di vê navberê de **"Jin û Ragihandin"** ji serekîtirîn mijarên hizrmend, civaknas û nemaze karbidestên pirsên jinan bûne.

Di cîhana îro de pêşketinên teknolojiyayê, têkilî û pêwendiyên cîhanê pîrr hêsan kirine, bi terzekê ku ji sînoren navnetewî derbaz bûne û bandorên zor xistine ser siyasetên giştî, bîr û boçûn û liv û tevgerên mirovan, nemaze zarok û nûciwan ku weke pêşeroja welat tîrî hesêb.

Şarezayên warê ragihandinê bi bawer in ku medya dikare bihayên bingehîn ên şonasa civakê bixe bin bandora xwe de. Anku mirov dikare bi mifahwergirtin û bikaranîna dezgehên ragihandinê, bandorên erênî û nerênî bixe ser hizr û ramanên xelkê. Ku wisan e em dikarin bibêjin medya rolên bingehîn û bibandor li ser pêwendiyên civakî û guhertina rayên xelkê dilîze.

Lê ewa ku em dixwazin vir de li ser bisekinin, pêgeha jinan di ragihandinê civakên mîrserdest û paremay de ye.

Civaknas, bawer in ku rola giştî a medyayên giştî, di civakên mîrserdest de, liberçavnegirtin û buha nedan bi hêz û şiyarên mirovî ên jinan û xurtkirina ramanên şaş derheq jinan e.

Desthilatdarên civakên mîrserdest, cehdê dikin bi bikaranîna dezgehên ragihandinê, bibêjine me ku jin nikarin welat birêve bibin û divê tenê rolên weke hevjin, dayik, kabanî û... bigirin stûyê xwe. Ger mirov bi hûrî balê bikişîne ser pirogramên televîzyûnî ên civakên han, nemaze ew filmên ku berhem tînin, jêre derdikeve ku sîstem çawa wan rolane hîne

jinan dikin û cehdê dikin tiştên han bal jian weke tiştên normal û asayî nişan bidin.

Di tîtina femînîzman, nişandana dîmenên han ji jinan di ragihandinê giştî de, şikleke îdeolojîkî ye bi armanca domandina pêwendiyên mîrserdestiyê.

Di ragihandinê civakên mîrserdest de, mîr weke mirovekî desthilatdar, zal û serkevtî, çeleng û êrîşker tîrî nişan dan û pîrr rolên curbicur û girîng ku serkevtin tîde tenê girêdayî ye bi şarezabûn, pisporbûn, kêrhatîbûn û lojîkbûnê. Lê li hember de jin zêdetir weke mirovên stûxwar, bîndest, pasîv, neçeleng û bê biha tîrî nişandana û zêdetir di rolên lawekî û mandoker de derdikevin. Ragihandinê han bi nişandana jin û mêran di rolên han de, dixwazin heqîqeta rolên regezî û newekheviya cînsî îsbat bikin.

Serbarê hebûna rolên cud cuda û hevkarîya berdewam a jinan di cîhana di halê guhertin de, ragihandinê civakên mîrserdest, wêneyek wekhev ji jin û mêran, nişan nakin. Tundûtûjînya han û nişandana rûçîkek xirab û sivik ji jinan, ku di ragihandinê wan de belav dibin, bandorên nerênî dixê ser jin û çalakîyên wan ên civakî.

Ji aliyek din ve ew pirogiramên ku li ser rola sunetî a jinan tekez dikin, êrîşker û metirsîdar in li ser çalakîyên jinan.

Li vir pîrsek tî holê, gelo çima dezgehên ragihandinê piropagende ji bo nêrînek han dikin? Di halekê de ku ew dikarin bandorê bixin ser ramanên xelkê bo tiştên pozetîv û baş.

Ger em bîr û lêkolînê li ser berpîrsên wan ragihandinan bikin, dibînin ku giştî berpîrsên wan ên sereke, mîrên paremayî û bîrîşk in û di rastî de dezgehên ragihandinê weke alaveke bona teztîrkirin û sepandina boçûn û îdeolîjîyên paremayî ên xwe bo ser raya giştî bikar tînin û em dikarin bibîjînin mixabin wan kariye heya qasek zaf, di karê xwe de serkevtî bin.

Heya dema ku derfeta birêveberî, biryardan û birêvebirina ragihandinan bi terzek wekhev û bê liberçavgirtina regezî, bo takên civakê nehê dan, em nikarin



çavnihêre misogerbûna mafên wekhev di navbera jin û mêran di giştî warên civakî, siyasî û aborî û regezî de bin.

Pirranîya ragihandinê civakên mîrserdest hewil didin jinan ji kar û çalakîyên siyasî dûr bixin. Jin di filman de yan di di halê giryanê ne, yan hawar dikin, yan pîrr pê dikenin, yan zû tîrî lêbandin û hînek caran jî zalim in. Rûçîkek ku bi tewahî dûr e ji rastiyê.

Lewma divê bibêjin ku jêrdehatina rûçîk û kesayetiya jinan di ragihandinê civakên mîrserdest de, astengek mezin e li hember pêşkevîna wan.

Di dawiyê de divê bibêjin ku guhertina bîr û boçûn û deb û edetên nîşan, ne karek senahî ye, lewra divê em hemû bi hevve, nemaze kesayetiya rewşenbîrên civaka me ji hemû rêyekê bi armanca sekinîn li dijî îdeolojiya han bikar bînin, Rewşenbîr divê bi pêkanîna zext û givaşan bo ser dewletan, wan neçar bikin ku rêz ji kesayetiya jinan bigirin û derfeta hatina wan bo navqada siyasî, ragihandinî, aborî û civakî pêk bînin. Ewa jî tenê ji rêya rewşenbîrbûna civakê tî encam dan. Çimku her wek me li serê îşare pêkir, ger raya giştî tevî desthilatdaran nebe, ew qet nikarin ramanên xwe ên han bidomînin.

## Diyardeyek Civakî Û Çend Peyvek



**Cawîd Esxerî**

Qetlên namûsî, yek ji diyardeyên herî berçav û xirab ên civaka me ye ku mixabin carê li gel hest û roh û çanda kurdan de dijî û metirsî û siya reş a

wê her li ser civakê maye û giraniyê dike. Helbet çand û asta rewşenbîriya kurd û serdema niha ya ku kurd tîde dijî, gellek ji vê diyardeyê re rêxweşker e. Eyan e li wan civak û welatên ku li halê bihorîn û derbasbûn ji qonaxa sunetê ve bo

modernîzmê ne, diyardeyên wiha xurttir û gotiyên wê jî zêdetir dibin. Her çend ku rengesaya wan civakan jî li gor normên serdem û şaristanî jî bibin-, lê tîgîhîştin û hezîmkirina wan bal takên civakê demek dirêj, bêhnek fireh û hewl û xebatên zêde dixwaze. Li vê navberê de, jin goriyên sereke yêrîn vê diyardeyê ne. Civaka kurdî jî ku civakeke mîrserdest, kewneşop û li bin nîrê zordarî, tepeserî û dagîrkeriyê de heya niha jiyaye û bi zorî û berqesd ji mafên rewa yêrîn xwe bêpar û herwiha ji karwanê xwepêgîhadin, rewşenbîrî û pêşketinê jî pare maye, siroştî ye ku zû nekare çanda



xwe nû û kirasê kewn û rizî yê xwe jî



### Doma Gotara Diyardeyek Civakî û Çend Peyvek

bidirîne û xwe li gel bîr û hizrên serdem biguncîne. Bi taybet bîr û hizrên ku rêz ji mafên tak û wekheviya jin û mêran digrin. Lewma her ku diçe, jinên kurd jî di bin bandora çeka modernîzmê û li bin siya pêşketina teknolojiyê de bi mafên xwe hevnas dibin û dixwazin kesatiya rastîn a xwe bibînin û di jiyana, çarenivîs û qedera xwede xwedî biryar û hewest û pêgeha taybet a xwe bin.

Lê çanda hezar saliya kurd wiha bi hêsanî nikare xwe ji wî kirasê sunnetî rizgar û kirasê nû û modern li xwe bike û di eql û têgihîştina xwe de bawerî û rêz ji mafê beramberê xwe bigre û pêwaziyê ji reformên civakî bike.

Ji hêla din ve jî civaka kurdî, civakek olî ye. û şerî û ol jî li cihê xwe de wekî

dîwarek qahîm û teldiriyekê li hember wan reform û nerînên serdem de cî girtine. Bitaybet jin gelek bi sînora û di çarçoveyê berteng de cih daye û ji ber çend sedeman rê ji bo kuştin û bê mafîya jinan xweş dike.

Lê pêlên bihêz yê modernîzmê ewqas bihêz in ku tu asteng û berbendek nikare li hember de dewamê bîne û hemû qeyd û bend û zîncîrekê diqetîne û xwe vedizelîne nav çand û civakan.

Li Îranê de jî dibin sîbera reş û yasayên hişk û neguher û dijî jin yê rejîmê de, jin gelek sînordar û tîn çirmisandin. Ji her terze azadî û mafekê hatine bêpar hiştin û jin weke kala û namûs û şerefa mêran hatiye pênasekirin. Bûna yasayên weke kewirbaran, hesibandina du jinan wek mîrekê û gellek yasayên din yê dijî jin, hevdem li gel çanda paremayî, zêdetir destê mêran di kuştina jinan de vala dihêle. Lewma piraniya herî zêde ya qetlên namûsî li Îranê de tu astengekî yasayî bo mêran pêk naîne û pêvajoyek asayî bi xwe girtiye.

Lewma netenê yasa li Îranê de dijî jinan e, belkî tu mafek yasayî jî bo dûreçûn û dozvekirin bo jinan li dosyayên wiha de nîne.

Ji hêla din ve jî aborî li destê mêran de ye û wê yekê desthilatek zêdetir daye mêran. Eva jin/an tim çavjidest û bindestê mêran dihêle. Çûnku li gor vê yasa û kulturê erk û rola sereke a jinê li malê de hatiye diyarîkirin û karên navmal, xwedî kirina zarokan û xwarin patin heya niha bi karek bimaş nehatiye pênase kirin, eva jî jinan tim bendewarê mêran dihêle û rîya tund û tûjîyê jî dijî wan xweş dike û ger rewşeke serbixwe bo jinan di warê aborî de pêk nehê, egera berdewam mana wê bindestiyê ji nav naçe.

Li rastî de ew çand, yasa û rîsayên han weke xencerekî bi jehr û bijan li cismê civakê de ye û nivîya laşê civakê seqet kiriye û heya ew birîn jî nehê çareserîkirin, civak pêş nakeve û dê ji karwanê pêşketinê jî pare bimîne. Lewma eva ne tenê pirsgerêka jinan e, belkî pîrsa hemû civakê ye û divêt jin û mêr bi hev re û mil bi milê hev bo çareserî û jîholê rakirina vê nesaxiyê bixebitin û bixwe pirçek kirin bi çeka zanist û rewşenbîriyê û hevlên berdewam gel takên civakê bo rohnkirina wan ne tenê dê bikarin vê arîşeyê çareser, belkî pêşerojek baş bo civakê jî misoger bikin. Nexa berevaj, pêlên modernîzmê û kultur û yasayên hişk yê heylî dê goriyên zêdetir bistîne û civak jî dê her paremayî û seqet bimîne.

## Bêkariya jinên xwendekar li Îranê de

Li halekê de ku hejmara bêkariyê di Îranê de roj bi roj zêde dike hejmara bêkariya jinên xwendevan bi taybetî di salên dawî de pir zêde bûye. Tê pêşbînî kirin ku ew pêvajoyên han jê her zêde bikin.

Ligor amarên nû ên navendên amara Îranê

di warê jîher cuda kirina jinên xwendevan ên di asta bilind û navendî bi giştî di şar û gundan de 887 jî jinan li bajaran û 594 jî di gundan de bêkar in.

Di vê demê de, tenê li bajarê Tehranê nizîk bi 800 hezar kes bêkar in ku piraniya herî zêde a wan jin in.



## Pîlanên Rejîmê, Marên Du Serin

### Kewê zer

**L**i gor ragihandina Fars, di rojên despêka sala nû a 1389'ê Rojî de, Navenda lêkolînê Perlemana Komara Îslamî a Îranê, 28 pîrsên civakî xistin ber Wekûlînan û

dinava wan 28 pîrsan de di ragihandina xwe de eşkere kir ku bêkarî, tûşbûn bi madên hişber, nedarî û tîlaq weke çend pîrsên girîng û pîrsgerêkên niha yê civakî di welatê Îranê de ne.

Her di wê ragihandinê de hin amarên xelkê akincî li bajar û gund û herwiha jiyana kûçberên welat hatine kirin. Hejmara wan jî diyarî kirine û liser wan zanyariyan û bigor wan hesaband, hin şîrove ji bo giriftên civakî û bitaybetî bêkarî bi serhijmêriyên cuda cuda ên temenên xelkê bêkar polînbendî kirine û ...

Ewa ku balkêş bû, ne ew ragihandin bû, belkî bêkarî ya rejîmê bû ku eger em wiha bas jê bikin û şîroveyek ji wê bêariyê bikin wiha dê bînin ziman.

Pêka nasîna ku ne tenê hêzên siyasî û xebatkaran Îranê û xelkê berevankarên mafê xwe, belkî hemû civaka navnetewî li ser Komara Îslamî a Îranê heye, di çarçoveya wê desthilatê de mirov nikare tu navwend û hêzekê bi serbixwe û medenî bizane, heya ku mirov bikare ragihandina fermî a her nawend û aliyekê di bazneya Komara Îslamî de bi dîr jî tîkiliyên nîzame bihsibîne. Belkî bi heûna sansor û kuntirrolên tund ew ragihandin dibin peyva wê rejîmê. Seba wê yekê, em dikarin wiha bêjin ku Komara Îslamî, îsal ew diyarde ên haşane kirî weke pîrsên girîng ên civaka Îranê hilbijartin ku carek din bi berhevkirina rîyek din a xapandin û rê ji ber windakirinek din a xelkê welat biceribîne. Vê carê jî bi navê lêpîrsîn û bi dîvdeçûna pîrsên civakî kirine armanca serkevîna pîlanên xwe û heyamê temenê xwe bi mijûl kirina heşên xelkê bi pîlanek din a siyasî lê di qalibê hewlek civakî de, bidomîne. Lê ne ew diyardane tiştê teze ne bo xelkê û ne jî destê rejîmê di wan karane de bidûr e ku weke giriftêk civakî ji bo rejîmê cihê pîrs û nîgeraniyê be, ne jî xelîk ji pîlanên rejîmê bê aga ye ku ragihandinek wiha ya destnîşankirina pîrsgerêkên civakê cihê dilxweşî û hêviyekê be bo civaka Îranê ku bi giştî bi vî derdî dinalîne.

Bi bawera min ew kare li beramber pîrsêk din a girîngtir û micittir ji bo rejîmê de ye ku hekî pîrs û giriftên civakî hertim di berjewendiya rejîmê de bûye, ew pîrsa din ku pîrsêk siyasî ye, bi tu awayek di berjewendiya nîzama Komara Îslamî de nîne, belkî gefek pîr micit e û rejîmê jî hest bi wê pêla bihêz a beşdarîkirina xelkê di bizavek siyasî de kiriye. Ew bizava ku piştî maşkanê ya hilbijartinê Serokkomariyê di sala derbazbûyî de destpêkir, heya niha jî bi dawî nehatiye û eger tenahî û aramiyê nisbî jî, di encama tepeserî û zordariyê de hebe, mîna aramiya berî bahozê ye.

Rejîma komara Îslamî ku nikare bi awayek rasterast berbi rûyê wê pîrsê bibe, eşkere ye ku her rîyek mumkîn dide ber xwe. Yek ji wan rîyan lêbandina xelkê bi pîlanên xwe ên nemirovane ên mîna marê du ser dixwe canê xelkê û bi serekê derdên giran û belayên mezin û nesaxiyên civakî tûşî xelkê dike û bi belavkirina wan diyardey ên ku Perlemanê ragihand. Bi serek din jî di demên tengasiyên siyasî de pîlanên xwe eşkere dike bi navê vekolîn û lêpîrsîn ji pîrsgerêkên civakê. Ew pîlanane weke bîrsî kirin, belavkirina madeyên hişber, bêkarî û di encam de nedarî û tîlaq û jihev belav bûna malbatan û di demên pîrsên siyasî ên gef li ser hebûna rejîmê, anîne ziman a wan arîşeyên civakî li rastî de pîlanên darêti, dibin ragihandinên fermî ên rejîmê û piropagende ji bo wê yekê ku bi her awayek be rê ji ber xelkê wînda bike û rewî û meşrûiyetê ji xelkê werbigire ku bikare temenê tepeserkariya xwe bi ser xelkê de dirêj bike û bitaybetî xelkê ji pîrsa siyasî ya ku rîya nemana rejîmê dişopîne, bidûr bigre.

Ewe di halekê de ye ku li hemû welatên demokratî de yê wan azadî û mafê jiyane têde hebe, desthilatdar bi rîya xizmetkirin bi xelkê hewla bidestxistina dengê şeriyetê dide, lê Komara Îslamî a Îranê bi pîlanên nemirovane xelkê bîrsî dike û nan li beramber dengê neçarî ê rewatiyê vediguherê. Lê êdî di sala derbazbûyî de xelkê selimand ku bi dengê meşroiyyet bi komara Îslamî bîrsîtiya xwe qerebû nake.



# BEHREDARÎ

ADAR JIYA  
adarjiyan@mynet.com



Kaniya Helbestan

## Newroz



### Bêwar Mirgewerî

Newroza jînê ku hat  
çaxê ku şîn dibe tev welat

Hate der kanî li bin erdê  
sar  
derman kir derdê çol û  
neval

Quling ku vegeyriyan li  
germîyanê  
mizgînî dan tev xelkê  
kurdistanê

Şivanan ku lêda bilûla  
boharê  
dan mizgînî bo heyva Adarê

Çaxê ku hat dengê qebe  
qeba Kevan  
xatir xwast Reşemê li  
Adarê

Disan dê şîn bin gul û Sûsin  
û Beybun  
mizgînî dê bidin bo xelkê  
mezlûm  
wa dîsan hatin Kawayên  
asingir!

Newroza jînê ku hat  
dawî tê bi temenê Zehak!

**H**er mirovek nîrxek e. Her mirovek cihanek e. Û her mirovek jiyaneke veşartî ye.

Mirov xwediyê behre û hunerweriyên resen e û hemû cerbezî û taybetmendiyên cûrbicûr di mirov de dihevin. Ango her mirovek di warekî de serketî û pêşketî ye. Jixwe mirov nîn e ku aliyekî wî/ê yê pêşketî an jî paşketî tunebe. Carekê ne gengaz e ku her mirov di her warî de bikêrhatî, serfiraz û serketî be. Belê negengaz e ku ji her aliyê ve an jî ji berê de bêkêr nebi kêrhatî be jî.

Meyla her mirovekî/ê li ser tiştêkî ye û her mirovek meyla xwe dide aliyekî jiyane. Bi xwezayî aliyekî digire û aliyê din berdide an an di ser guhê xwe re tavêje. Ev yek jî dibe sedema çiqilbûn û pişekariyên mirovan ên cure bi cure. Ger ku her mirov di her karî de serfiraz û serketî bûna, di navbera takekes û kesantiyan de tucar cudayetî û cihêrengî dernediket û wê şaxê wateya gêrûf û şanpaziyên mirovan jî nedima. Her wiha hewcetî bi dengbêj, hunermend, wêjevan û şanogeran jî nedima.

Hêz û meyldariya karekî an jî têrîkirina cehd û xebata mirovan, behredariya wan kifş dike û lebat û bikêrhatîbûna wan derdixe holê. Zanebûn û zanyariya mirovan a taybet û hêza behreyên wan ê veşartî jî gelek caran wekî jêhatîbûn û bikêrhatîbûna wan têtê dîtin û ceribandin. Belê beriya wê, ji bo ku karzanatî û şarazatiya mirovan bête dîtin û pêşandan, divê pêşî merc û derfetên kifşkirina behreyên wan bêne afirandin. Lewre behreyên mirov yê nependî her gav li gorî merc û derfetên civakê têne vedîtin. Kesên hunerwer û behredêr jî li gorî behre berhemên xwe têne venasîn

Behreyên vegotin û axaftinê jî hin ji wan behreyên veşartî yê ku her car bi derfet û ceribîneriyên rojane re derdikevin holê, ne Di civakê de heta ku mirov neaxive tu kes nîzane ew kes çî xweşikiyan di xwe de dihevin. Heta ku mirov stranekê nebêje tu kes nîzane ku ew kes mirovekî/e dengbêş an stranbêj e. Heta ku mirov nenivîse an hestên xwe dernebirê tu kes nîzane ku ew mirov nivîskar an helbestvanekî hêja û berdar e. Ji bo wê divê pêşî derfet û fersend bêne afirandin. Hem ji bo vedîtin û venasîna behreyên mirov hem jî ji bo pêşxistin û geşedaniya behredariya wî/ê, hewcedarî bi xebat û lebatên takekes û kartêkeriya wî/ê heye. Çimkî, kî bi çî karî mijûl dibe, bêşik dê di wî karî de bi ser bikeve. Her wisa, di kîjan warî de bi ser

bikeve jî dê di wî warî de behre û berdariya xwe derbixe pêş. Girêdayê wê, dê ew ber û berhemên xwe jî pêşkêş bike û bide pêşandan.

Wekî ku li jor jî hate diyarkirin, behreyên mirov li gorî merc û derfetên rojane û li gorî fersend û derawayên demê têne bikaranîn û pêşandan. Her mirov xwedî behre ye û her mirov dikare di warekî de bi ser bikeve. Her mirov hêz û behreyên veşartî di dil û mêjiyê xwe de dihevine. Belê ji bo ku ji hêz û behredariya kesên afirîner sûtê bê wergirtin jî divê pêşî merc û derfet û cih û war bêne afirandin.

Bo nimûne : Heke ku ji aliyê mirovan de goga pêgogê nehatiba dahêrandin, îro gogbaz û pêgogvanên navdar ên mîna Pele, Maradona û Ronaldo û hwd. dernediketin holê û nav û dengê wan li dinê belav nedibû. Heke ku muzîk û alavên muzîkê nehatiba dahêrandin îro tu kesî nikaribû behsa muzîknas û muzikarên mîna Mozart, Beethoven û Pavorotti û hwd. bikira. Dîsa heke ku pêûs û nivîs nehatiba dahêrandin, navê wêjevanên mîna J.J. Rousseau, Tolstoy, Dostoyevskî, Gorkî, Leo Buscaglia û hwd. nedihate bihîstin û helebstên helbestvanên mîna Ehmedê Xanî, Poul Eluard, Cegerxwîn, Ferîdûn, Ehmed Arîf, Nazîm Hikmet, William Butler Yeats û hwd. nedihate xwedin.

Girêdayê vê yekê, heke ji bo ziman, çand û hunera kurdî ked û xebat nehatibûna kirin û ji bo derbirîna nîrxên hest û bestên neteweyî merc û derfet nehatibûna afirandin îro me nikaribû van rêzikan li vir binivîse û îro bi sedan nivîskar û helbestvanên kurd dernediketin holê.

Bi rastî ji bo nivîsandin û derbirîna zimanê kurdî îro gelek merc û derfet hatine bidestxistin. Ev ji bo her wêjevan û hunermendên kurd siûdek e. Ev, fersendeke bêhempa ye ji bo her kurdî. Divê her mirovê/a kurd xwe di van mercan de biceribîne. Û jin û mêr tev, hemû behreyên xwe bi pêş ve bixin û xislet û xisûsiyetên xwe bidin pêşandan. Carekê, divê astengî û qedexekirin ji bo me nebin spartek. Heke ku em dil û mêjiyê xwe azad bikin û biparêzin, qeyd û zincîr jî nikarin cest û hestên me dîl bigirin.

Seneca dibêje:

"Erd çî qas dewlemend dibe bila bibe, heta ku neyê ajotin berhem nade. Serî jî wisa nîn; seriyên neçandî nikarin ramanan hilberînin."

# Sêzdebider Û Eşq Û Şadî

## Amade kirin: Rondik

13'ê Xakelêweya her sal bi Sêzdebider tê naskirin. Sêzdebider yek ji cejn û sunetên kevnare newrozî û dawîya van zîncîre cejna e ku ji kuleçarşemiyê ve destpê dike, bi newrozê xurt û li sêzdebiderê de jî bi dawî dibe. Bi wateyek din, roja pena birin ber siroştê, dûrkirina nehsyan, destpêka kar û xebata di sala nû û hêvî bi salek pir destkevt û geş e.

Li çanda kevnar ya Îraniyan û ayîna Zerdeştîyan de, roja 13'ê ya her mehekê bi navê sitêrka Tîr ya Tîşter "xweda û horiya baranê" hatiye binav kirin ku tîr Tim bi dêwê hişkesaliyê re şer kiriye. Lewma di roja 13'ê Newrozê de xelîk derdiketin çiya, deşt û dolan û li hembêza siroştê de demên xwe bi xweşî û şadî diqedandin û, hêvî û daxwaza barîna baranê û salek tîjî xweşî û şadî û bereket ji Ehora Mezda dikirin.

Ji wê demê were heyaniha bûye bi parek ji kultur û çanda Îranê yane.

Sêzdebider ku wateya xweşî, şadî û aştîyê digehîne û reh û rîşalên xwe bi kûrî li van Îraniyan de dakutîne, niha di Îrana bi siya Komara Îslamî de çawa birêve diçe? Rejîmek ku evîndarê merg, reşatî, şîn û taziyan e û bi hemû awayekê li hember şadî û azadiya xelkê de rawestayê.

Rejîmek ku êrîşê bike ser mêvandarî û davetan, CD û kasêtên mozîkên şad ji ajotvanên Otombêlan distîne, ruha muzîkên şad dikuje, şadiyê û dêmode dihesibîne, rojên şîn û taziyê li rojîmêra Îranê de zêdedike, hewlê bo guherandina rojên cejn bi rojên xembar dide, liberkirina rengên vekirî û şad li navendên dewletî de qedexe dike û... ku hemû nîşane ji dujminahiya rejîmê bi şadî û keyfxweşiyê digehînin,

divêt çavan bê pênase kirin.

Lê ji aliyê dinê jî eve sê dehsal in ku xelkê Îranê bi meşandina jiyane û birêvebirina cejn û merasîmên xwe, bawer û îdolojiya rejîmê birine bin pirsyarê.

Civaknas Mecîd Mihemedî di gotarekê de balê dikêşîne ser sêzdebider, eşq û şadiyê li bi sîbera komara Îslamî de û sedemên dijberî û

dujminahiya rejîmê bi şadiyê re destnîşan dike û dibêje:

Sêzdebider yek ji wan rojan e ku rejîm ji ber naverok û kakila xwe ya dijî eşq û şadiyê, dijberiyê pêre dike. Lê sêzdebidera 1389'an her weke Kuleçarşemîya 1388'an bûye bi qadek din ya birine bi pirsiyara hikûmeta evîndarê reşatî û xembariyê.

Şadî û keyfxweşî, îmkana raderbirîna azad a hestên xwe, dide mirovan. Lewma hikûmet ji wê yekê ditirse ku neku derbirîna azad ya xelkê, tarandin û dijberiya bi rejîmê li peyre bê. Tîrsa rejîmê ji wê înkarkirinê li qada giştî û derketin ji kurtirola siyasî de, dibe sedema dijberiyên bi şadiyê re. Çunku dizane xelkek xembar, xemok, nerihet û nîgeran zûtir û hêsantir tîr kurtirolo kirin heta yê şad û serkell. Qedexe kirina kunsertên hunermendan û reqs û semaya ciwanan li Îranê de nimûneyek zindî ya wê gotinê ye.

Sedemê din ya dijberiya rejîmê li gel Sêzdebiderê re, eşq e. Çunku eşq jî her wek şadiyê li çarçoveya îdeolojiya rejîmê de



TSNA

nahê hebsî kirin, lewma rejîmê tirs ji eşq û evîne heye. Çunku li wê rojê de cewek azad li hembêz û berçêla siroştê de desthilatdar e û renga ew roj bibe bi qada çavzilkên û evîndariya kur û keçan Rejîma Komara Îslamî Ji bo keç û jinan, sînûrek berteng diyarî kiriye û ew li nav çarşewê de veşartine, çunku li gor îdeolojiya rejîmê, bedena jinan çavkaniya fesadê ye. Divêt jin haydarê liber kirin, rêçûn, axaftin, kenî û riftarên xwe bin, ji gulav û bêhnên xweş xwe biparêzin, daku hest û hewesa mêran nelive!! Lê derketina xelkê û guhnedana bi wan xorafatan, li cihê xwe de serketina bi ser wan bawerên şaş ên rejîmê de ye.

Li civakê de ku mirîbawerî û mirîdostî têde hakim, şadî û eşq jî qedexe, bêşik eşqa bi jiyane dê li dîtina rejîmê de bi serkêşî, nefermanî û dijî yasa û şîrieta hikûmetê bihênesibandin. û bûn Lewre renga ji niha şûnde pêngava din ya hikûmetê, mehkeme û dadgehîkirina xelkê bi tawana derbirîna hesta şadî û jînbaweriyê be!

## Wan Dibe Xwedî Nasnameyek Nû

Walîtiya Wanê li bo ku Wan nasnameya 'Bajarê Cîhanê' bistîne dest bi projeyek nû kir.

Li gorî daxuyaniya Walîtiyê, xebata projeyê ku dê bi beşdariya saziyên civakî, taybet û saziyên sivil ve bê meşandin dê 12 mehan bidome. Bi




lijne û komên bêne avakirin dê armanc diyarkirina 2023 vîzyonê bajar be.

Ji bo ku Wan ji perwerdehiyê heta tenduristiyê, ji çavkaniyên mirovan heta bajarvaniyê, ji çand û turîzmê heta sewalkariyê bi gelek sernavan bikeve nava bajarên serek, dê xebat bêne meşandin.

Di daxuyaniya ku tê de "nasnameyê nû ji bo Wanê" tê armanckirin de hate diyarkirin ku xebat dê li gorî salnameyê pêk bînin û civîna yekemîn a der barê projeyê de jî dê 5'ê Nîanê bê lidarxistin. **netkurd**

## Yekemîn romana Kurdî "Miryema" li Başûrê Kurdistanê bi zimanê Ingilîzî derket

Ev yekemîn car e ku roman li devera Behdînan, li Kurdistana Başûr, bo zimanê Ingilîzî tê wergerandin û çapkirin. Romana "Miryema" – kiçejiyek ji zemanek din" a romannivîsê Kurd Sebrî Silêvanî ye, çapa Kurdî li sala 2007 an li Duhokê hatibû çapkirin, piştî du salan, ango 2009-2010 roman ji aliyê xanima hêja Huda Mehemed Salihi, mamostayê romanê û seroka beşê Ingilîzî li kolîja



edebiyatê, zankoya Duhokê, hate wergerandin.


Mamosta Huda dibêje: "Me wek kolîja edebiyatê li Duhokê romana Miryema – kiçejiyek ji zemanek din, wergerand Ingilîzî ji ber ku mînakek e bo romana Kurdî a nû û aniha wek pirtûkek rîsmî ji aliyê xwendkarên qûnaxa çarê li kolîja edebiyatê tê xwandin..

**Netewe**



# Şiroveya Gotinên Pêşyan

Beşa 14



Çiya Mazî

xwe hinek dixwazin bi zorê qaliban deynin û wekî siyasî, çandê jî jî nûv de biafirînin. Lê çana bi awayekî xwezayî pêşdikeve û cihê xwe dibîne. Rast e mirov rê li ber vedike an hewl dide

ku çand bibe çandeke gerdûnî, lê ev yek bi zorê nabe. (Ç.Mazî)

1. "Axa û beg hemî xwînmij ir!" Min dîtîye ku pirên camêran ji biwêjan re gotine "Gotinê pêşyan" lê min kes nedîtî ye ku ji ber xwe ve gotinên pêşyan derxe, ji gotin û peyvên ji rêzê an duruşman re bibêje "gotinên pêşyan" Qey gelo hûn çî difikirin? Gelo Pêşyên Kurdan, hemu şoreşger bûne, hemu marsîst-lenînîst bûne û li dijî axatiye derketine? Ez dibêim bi van peyvên nizmik û biçûk rûmeta bêjeya Kurdî jî namîne. (Q.Dêrsilavî)

"Ev şiroveya Brêz Dêrsilavî di cîh de ye û gelekên bi vî awayî derdikevin pêşberî mirov. Heke ev gotineke pêşyan be divê peyvên zanistî û peyvên teorîsyenên siyasî gîş bibin gotinên pêşyan. Ev jî xetereyek mezin e. (Ç.Mazî)

Min ji gotina "Di roja tengiyê de, emir kurt e" tu tişt fêm nekir. dibe ku ên fêm kiribin hebin. (Q.Dêrsilavî)

"Bi baweriya min ev, ji bo perosiyê hatiye gotin. wekî di rojên teng de ne hewceyî emirên (fermanên) dirêj e. Divê bi lezgîni ferman bêne dayîn û kurt bin. Dîsa wekî 'di rojên tengiyê de emir (temen) kin' be. Wekî 'di şeran de emir kin e' an bi perosî mirov bijî, beden jî zû dihele. Ev jî tişteki zanistî, ilmi ye.wateya hinek gotinên pêşyan pir kûr e. Ç.Mazî."

2. "Xwar rûnê, rast bipeyîve" Gotineke Tirkî ye. Divêt, mirov diziyê neke. Ji xwe kesî xêr jî malê diziyê nedîtî ye. (Q.Dêrsilavî) Rast e. Ev gotineke jî çanda Tirkî re bûye milk. Li form û zimanê Kurdî qet nayê.Ne hewce ye ku mirov gotinên Pêşyên neteweyên din bike yên Kurdan. Ji xwe yên wan jî bi vî awayî pir in.(Ç.Mazî)

3. "Yek ji me çil, çil ji me yek" Tu têkiliya vê û gotinên pêşyan bi hev re nîn e. "Di Tirkî de dibêje 'yek ji bo me gişan, em giş ji bo yekî'. Ev jî biwêj e. Lê di Kurdî de wekî gotineke pêşyan xuya ye. Li hin deveran jî hatiye gotin ku 'çil ji bo yekî, yek ji bo çil'. wekî biwêj xuya ye lê ji ber ku hukum tê de heye dibêje 'çil ji bo yekî kar bikin û yek jî ji bo çilî kar bike' ango ji bo hevdû kar bikin, alîkariya hevdû bikin. Pend jî tê de heye, dibêje "herkes berpirsiyariya xwe bi cîh bine û heke yek ji bo çilî an ji bo giştî kar bike, çil jî ji bo yekî dê baş bifikire û wî biparêze. Ji ber van taybetiyana, me ev gotin wekî gotina pêşyan di ferhengê de jî şîrove kiriye. (Ç.Mazî)".

4. "Malê dinyayê li dinyayê dimîne" ev jî ne Gotina pêşyan e. (Q.Dêrsilavî) "Rast e ev ne gotineke ku mirov bibêje bi

wateyêke kûr an taybetiyek wê heye. Peyvek ji rêzê ye. Ç.Mazî"

"Gotin di cihê xwe de girîng e" Ne gotina pêşyan e û gotineke xweşe jî. (Q.Dêrsilavî)

"Bi baweriya min gotineke pêşyan e û "peyv" an "gotin" her û her di nava civakê de bi rûmet bûye û gotin wekî biryarê ye . Dibe ku mirov bibêje, pir sivik e. Lê dema ku di niqaşekê de bê bikaranîn pir bi wate xuya dibe.Ç.Mazî"

"Herkes tama debê xwe dizane" Ma ji ku herkes tama debê (ne debê, devê) xwe dizane? Ka wateya mecaz, ka wateya civakî? Gotineke ku bi tewrê mecaz "Tama devê xwe xweşe dike"ev jî ne gotina pêşyan e, biwêj e. (Q.Dêrsilavî)

" Herkes tama devê xwe dizane, wekî ku 'herkes ji xwe re ye', egoîzmê derdixe pêş. Ji xwe mecazîbûna wê jî ji wir tê û bi baweriya min gotineke pêşyan e. Di gotinên pêşyan gişan de wateya civakî (civakiya sazûbendî) ne hewceye ku hebe.Yên ji civakê re hatine gotin jî pir in . lê yên ji girseyan an ji hemû kesî re an ji komên kategorîk re hatin gotin jî henin. Ev yek taybetiya wan î giştî winda nake.Mînak heke li ser "xesûyê" an li ser "bav" hatibe gotin; ew li ser hemû "xesûyan" an li ser hemû "bavan" hatiye gotin. Ev jî dibe giştî. Ç.Mazî"

5. "Aqil bi peran nayê piştê" pir hatiye gelemşekirin. A rast "Aqil bi peran nayê kirin" (Q.Dêrsilavî)

"Herdu peyv wateyên cûda derdixin û cihê ne. Ya pêşî wekî "aqil bi pereyan nabe pişt (an piştgirî)" ye. Li ser piştgiriyê hatiye gotin "aqil bi pereyan nabe pişt". lê ya duduyan tenê li ser aqil û giranbihabûna wî hatiye gotin. Ç.Mazî"

6. "Qencî beyhûde naçe" û "Vir nabe rast, rast jî nabe vir." Tu têkiliya van û gotinên pêşyan bi hev re nîn in. "Dawiya vira nîn e û rastî bi înad e" hîn xweşe tir e . (Q.Dêrsilavî) "Peyveke rasteqîmîye. Tu mecaz tê de tune ye.Tenê dibe pendek. Ev taybetî tenê jî wê nake gotinek pêşyan". (Ç.Mazî)

7. "Bi qasî xwe bipeyiv e" nabe,li Kurdî nayê "Li gorî emelê (kirinên) xwe bipeyive" (Q.Dêrsilavî) "Di vê ferhengê de ' bi qasî bejna xwe pipeyive' cîh girtiye, wekî , divê mirov li gor rewş , mezinbûn û mal û milkên xwe bipeyive. Ev gotin wekî "fortan" jî tê bikaranîn. Lê wateya wê î gotinên pêşyan, dema ku şîret tê kirin " dibêjin ; divê herkes li gor rewşa xwe li gor emelê xwe û li gor zanîna xwe bipeyive".(Ç.Mazî)

8. "Feqîrî ji mirinê xerabtir e" ne gotina pêşyan e. Belkî gotina gel e. Ku bêjin "Mala feqîriyê bişewite" ew jî dibe biwêj. (Q.Dêrsilavî) "Gotinên pêşyan, ji xwe malê gel in. Herwiha hinek peyv û gotinên ku aniha di ziman de tene bikaranîn jî bi xêra wan gotinên pêşyan in. Lê haya mirovan jê tuneye ku ji ku hatiye. Wekî mînaka ve gotinê. Gotina yekemîn çêbûye ku gotina duyemîn hatiye holê. Pir hêsan xuya ye, lê bi baweriya min gotineke

pêşyan e, lê wateyek wê î pir sivik û fêmdar heye. Ç.Mazî."

9. "Diz ji tariyê hez dikir" ne raste. A rast "Tarîti kela diza ye" (Q.Dêrsilavî) "Li gor rewş û herêmê hatiye guhertin.Bi herdu awayan jî tê gotin. Lê ya duduyan hê pir bi forma gotinên pêşyan e." ( Ç.Mazî)

10. "Heram ji kesî re helal nabe" ev çî gotin e? Ku bigotana "Heram di qirka her kesî re naçe" xweş tir nedibû? (Q.Dêrsilavî) "Herdû gotin ne wekî hev in. Ya pêşî, wekî heram be, ji herkesî re heram e. An rastî ji herkesî re rast e. Lê ya duduyan raste rast li ser heramiyê hatiye gotin. Hilbet di dilê herkesî de derbas dibe ku mirov bibêje "wisa bûya nedibû? Lê belê aniha wisa tê gotin, dibe ku bi demê re forma ku brêz dêrsilavî bê ecibandin û bi cîh bibe. Ji xwe dîroka gotinên pêşyan ev e, bi demê re cihê xwe girtine. ' (Ç.Mazî) "

11. "Rê bi rêveçûnê xelas nabe" ji kengî deye, ku gotina Silo (yollar yürümeikle bitmez) bûye gotinên pêşyên kurdan? (Q.Dêrsilavî)

"Ez ne di wê baweriyê de me ku ev gotin ya Silêman be. Dibe ku ya hinek neteweyên din be an ya Kurdan be jî. Kî dizane, dibe ku Silêman li deverêke ev gotin bihîstibe û gotibe û herwiha bûbe malê wî. Ma gelo çanda Enedolê bi piranî bi ya Farisî û ya Kurdan re tevlihev nebûye? Ev tişteki xwezayî ye? ( Ç.Mazî)

12. "Peyv ji destan bilindtir in" min tu wate jê dernanî. (Q.Dêrsilavî)

"Dest bilinkirin" heye. di Kurdî de, wekî " li himber hin kesan serî hildan" tê fêmkirin,an lep hilandin. Ku mirov lepê xwe hiltîne wekî 'em jî şer dixwazin' , an dikeve nava şer û serî hidide. Di vê gotinê de dibêje, 'peyv an gotin ji şer hê bêhtir bi bandor e.' Carinan hinek peyv hene ku wekî mirov guleyan bera kesan de, ewqas bi wan zor e. Di şeran de jî gotin, carinan pir bi bandor in.Hinek şer jî tenê ji bo peyvekê derdikevin. Ji ber wê yekê jî wateya wê î mecazî heye û darazîye. Herwiha gotineke pêşyan e." (Ç.Mazî)

13. "Destê Komarê dirêj e"Ne destê komarê "destê dewletê dirêj e." Ev jî ne gotina Kurdan e. (Q.Dêrsilavî)

"Wekî me berê jî gotibû, li ser rewşa her tiştî ,gotinên pêşyan hatine gotin. Çima nabe ku ,Kurdên ewqas tahde ji destê dewletan ,komaran kişandibe û gotinekê ji bo destdirêjiya wan bibêje. Serokkomarên serdestên Kurdan her tim ev peyv gotiye ji Kurdên serhildêr re: "rojekê hûnê di desdêten me kevin"Bi ya min bi demê re evpeyv bûye gotineke Kurdan " Ç.Mazî)

14. Gelo kî ji gotinên "Bela nabêje, va ez hatim" çî fêm dike. (Q.Dêrsilavî)

"Di Tirkî de jî heye, lê di Kurdî de bi gelek cûreyî hatiye gotin. " ro ji qeda û bela derbas nabe" û wd . Mirov nikare bibêje 'bela îro nayê ezê rehet bim'. An 'bela ne diyar e ku kîjan demê bê ' wateya wê î mecaz ew e ku divê mirov tevdira xwe ji bo pêşiya xwe bistine. Ev jî wê dike gotineke pêşyan." (Ç.Mazî)

## Gelê Wanê Bi Hêk û Keviran Pêşwazî Ji Baykal Kirin

Li gor ajansên deng û basan, Serokê Giştî yê CHP'ê, Deniz Baykal, dema ji bo beşdariya di Kongreya Rêxistina CHP'ê ya Wanê çû Wanê, rastî êrişê Hêkên genî û Kevir hat. Li her cihê ku baykal çû, kurdistanîyan ji wî re Hêk û Kevir avêtin û ew şermezar kirin.

Wek tê zanîn CHP li Tirkiye de yek ji dijminên herî



sereke yên doza gelê Kurd e û bi her awayî li dijî mafên netweyî yên Kurdan derdikeve. Ji ber vê helwesta xwe, CHP li Bakûrê Kurdistanê tune bû, Lê hewlên Baykal ji bo xapandina kurdan hê jî didom in. Lê Waniyan carek din helwesta kurdan nîşanî Baykal dan û ew qewirandin..

Li vê derheqê de Deniz Baykal got, ew êriş ji aliyê AKP'ê ve hatibû amadekirin û pêwendiya gel bi êrişê re tune ye.

## Rejîma Tehranê Malpera TV' a Firans 24'ê, Fîlter Kir

Li gor nûçegihaniya Firansa, kanala televizyonî a Firans 24, roja îne ragihand ku rejîma Tehranê malpera ser bi wê kanalê fîlter kiriyê.

Ev karê rejîmê jî bi kiriyarek sansorê tê



hesibandin. Ew kanal ku bi zimanên Firansî, Îngilîzî û Erebî programên xwe diweşîne, ev karê rejîmê Îranê di çarçoveya pêşgirtin ji gihandina zanyarî û nûçeyan bi neyarên rejîmê zanî.

Di dauyanîya wan de hatiye ku ev sansore di demekê de hatiye encamdan ku hemû birêveberên wê kanalê, rojane guhartinên di warê bizavên girêdayî bi neyarên rejîmê re bi awayekê eşkere û bi hevkarîya internêta û wêneyên amator teqîb û dişopîne.

Eve jî di halekê de ye ku heftiya borî, Ajansa Muxabirat û Pêwendiyên NY û YE'ê daxwaz ji rejîmê kirin ku şandina parazit û çêkirina pirsgrîrêkan li dijî Radyo û Tv'ên derekî rawestîne.

## YE'ê Pêşwazî Ji Reformên Destûrî li Turkiyê De Dike

Derheq guhertinên destûrî li Tirkiyê de, Yekîtiya Ewropayê jî dîtina xwe eşkere kir. Stefan Fulê, berpirsê Komîteya berfirehbûnê di YE'ê de, daxûyanîyek li vê derheqê de weşand.

Di daxûyanîyê de hatiye



ew reformên ku di destûrê de çêdibin, gelek baş in û hewcehiyek mezin e. Fulê di berdewamiya daxuyaniya xwe de dibêje ku, reforma dadwerî ji bo pêşeroja Tirkiye gelekî girîng e. Ji bo vê yekê jî ger hemî aliyên siyasî di çarçoveya lihevhatinekê de ew guhertin bikiriban, dê pir baştir bûya. Di vî warê de çîqas dîtînen dezgehên sîvil û Partiyên siyasî bêne standin, dê ewqas serkeftîtir be.

Kompaniya Mazda:

## “Navê Me Ji Ehûra Mezda Ve Hatiye”

Kompaniya Mezda di malpera taybet a xwe de îşare bi navê kompaniya xwe, dike û dinivîsîne ku: Navê Mezda, ji Ehûra Mezda ve hatiye wergirtin ku nîşanek e bo zanyarî, zanist, yekgirtina mirovan, sîroşt û xudayên din.



Paşan dibêje ku yek ji sedemên nav û dengiya me, bo Ehûra Mezda, Xwedayê mezin ê Zerdeştîyan vedigere.

Di beşeke din de hatiye: Herweha ew nave nizîk e ji navê “Jujiro Matsuda” ku di sala 1920'an de ev kompaniyê ava kir û di sala 2006'an de jî me cejna 75'mîn salvegera berhemanîna otombêlê girt.

## Karesatek Mezintir Ji Şer

Rojnameya Ibtikar, raporek amarî li şer qurbanîyê rê û cadeyên Îranê belav kiriyê ku dide zanîn: Li her 25 deqîqeyan de kesek canê xwe di bûyerên hat û çûnê de ji dest dide, ku dike 22 hezar qurbanî di salê de. Li gor nirxandin û berawirdên YE'ê, her mirinek trafîkê, bi qasê 20 Milyard Riyalên Îranê zîrar û xisara abûrî çêdike. Ev karesatek bi gotinê gelek hêsan e! 22 hezar



kes li salekê de!! Lê gava ku mirov kûr bifikire, derdikeve ku di zaf ji şerên deverê de hejmara kuştîyan kêmtir ji wê hejmarê ye. Eve jî tê wateya wê ku em di Îranê de bi tiştê mezintir ji şer berbirû ne.

Herwiha dibêje ku hejmara kuştîyên sîvil yên welatên şerlêdayî ên Efxanistan û Îraqê di mehên herî bixwîn de, kêmtir ji goriyên hat û çûn û trafîkê yên mehek Îranê ye.